

## **Qeydkirina pêşdem ya merkeziyê ji bo cih di baxçeya zarokan de le bajarê Kehl**

Beşa perwerde û serperîştîya taybet bi zarokan û rêvebirêtiyên baxçe alîkariya we dikin ji bo dîtina cihekî li baxçe ya zarokan. Bi rêya “qeydkirina pêşdem ya merkeziyê” li ser malpera înternêta bajarê Kehl hun dikarin pêşdem xwe bo girtina cihekî serperîştîyê bi rêya înternête qeyd bikin.

Hun dikarin navnîşanên gişt baxçeyên zarokan di malpera înternêta ya bajarê Kehl peyde bikin an jî di broşûra “kehlInfo agahî di derbarê bajarê de”, ku li gişt rêvebiriyên û dayreyan û herweha li gişt şaredariyan tê peyde kirin.

Hun dikarin beşa perwerde û serperîştîya taybet bi zarokan li Weinbrennerhaus, li vî navnîşanî bibînin:

Hauptstr. 22, 77964 Kehl  
Telefon: 07851- 88 2102

E-Mail: [kitaservice@stadt-kehl.de](mailto:kitaservice@stadt-kehl.de)

### **Kesên muxateb**

Susanne Camara – Michaela Könnner - Birgit Bükler

### **Qeyda pêşdem – Online wisa çê dibe**

- Li ser rupela înternête û di vê lînkê de [www.kehl.de](http://www.kehl.de) biçin beşa perwerde, civak û kultur - baxçey zarokan.
- Beşa “qeydkirina pêşdem ya merkeziyê” vekin.
- Navê xwe qeyd bikin.
- E-Mailek ji we re tê. Ji kerema we ewî E-Mailê qebl bikin. Ji kerema we biçin beşa “Spam” ya E-Maila xwe û li wir jî temaşa bikin.
- Careke din beşa “qeydkirina pêşdem ya merkeziyê” vekin.
- Bi rêya passwort “şîfre” ya xwe navê xwe di rupela destpêkê de qeyd bikin.
- Ewan agahiyên bidin kû ji we tîn xwestin.
- Yek ji baxçeyên zarokan hijmar 1, 2, an 3 hilbijêrin.
- Lîsta pirsan li ba xwe biparêzin.
- Qebulkirin bi rêya E-Mailê dighîje destê we.
- Baxçeyên zarokan ku we helbijartine êdî dikarin agahiyên we bibînin.

### **Ji kerema xwe agahdar bin**

- Her zarokekî dikare tenê yekcarî pêşdem were qeydkirin.
- Her zarokekî dikare berî çêbunê bi sê mehan û zutirîn du salan berî destpêka dema serperîştîyê, pêşdem were qeydkirin.
- Heke hun sê baxçeyên zarokan hilbijêrin, hingê îhtîmal heye kû, ewan baxçeyên zarokan hemû jî ji we re derkevin û nav ji we re bê şandin.
- Heke hun tenê yek baxçeya zarokan ya xuyakirî dixwazin, hingê ji kerema we tenê yek baxçe ya zarokan hilbijêrin.
- Hun dikarin bi kêfweşiyê li baxçeyên zarokan temaşa bikin. Ji kerema we hertim û berdewam bi Telefonê dema hevdiîtinê diyarî bikin.
- Heke pêwîstiya we bi alîkariyê heye, têkilî bi beşa rêvebiriya baxçeya zarokan daynin, an jî têkilî daynin bi beşa perwerde û serperîştîya taybet bi zarokan li Weinbrennerhaus.

### **Qebulbûn wisa çê dibe**

- Di derbarê qebûlkirina zaroka/ê we de rêvebiriya baxçeya zarokan biryarê dide.
- Heke baxçeya zarokan cihê wê bo zaroka/ê we hebe, biryara qebûlkirinê ji we re dişînin û bi rêya E-Maila we dighîje destê we.

- Ji kerema we qebûlkirina ha bipejrînin.
- Ji bo karên qeydkirin hunê ji bo baxçe ya zarokan werin vexwendinê.
- Hunê îmze liser peymanê serperîştîyê û qebûlkirinê bikin.
- Bi wê yekê re jî cihekî didin we.

Di rewşa qebûlnekirinê de, ji kerema xwe tevî beşa perwerde û serperîştîya taybet bi zarokan re li Weinbrennerhaus peywendiyê daynin. Em pêşniyaza baxçeyeke dinê ya zarokan ji we re dikin kû, di gişt cihên bajarî û herweha nêzîk be jî.

### **Guhertina agahiyên di qeyda pêşdem de**

- Hun dikarin her dem agahiyên xwe di qeyda pêşdemê de biguherin.
- Ji kerema we careke din roja ji dayikbûna zaroka/ê xwe piştî çêbûnê nû bikin.
- Heke we navnîşana xwe guhert, dikarin navnîşana xwe ya nû, bi rêya qeydkirina pêşdemê ya merkezî nû bikin.
- Ji bo wê yekê jî pêwîstiya we bi password "şifre" çê dibe.

### **Tunekirina qeyda pêşdem**

- Qeyda pêşdemê ya we heya hingê dimeşe û çalake, heya qebûlkirin ji we re tê û cihekî bi dest dixin û digrin.
- Pişt re agahiyên we di lîsta qeydkirina pêşdemê de nayê dîtin.
- Lê agahiyên we di sîstemê de dimînin.
- Bi wî awahî jî hun dikarin di dema pêwîstiyê de qeydkirina pêşdem careke din çalak bikin.
- Weke mînak heke hun bixwazin baxçe ya zarokan biguherin, cureyeke din ya serperîştîyê an go pêwîstiya we bi berdewamiya serperîştîkirinê hebe li gor baxçe yê zarokan Elmanî-Ferenseyî Strasburgê.
- 180 roj piştî destpêkirina peymanê, agahiyên we bi tewawî tên rakirin.

### **Qeyda pêşdem bê înternê**

- Bê înternê jî hun dikarin qeyda pêşdemê ji bo zaroka/ê xwe çêbikin.
- Rêvebiriya baxçeya zarokan dikare di dema qeydkirinê de alîkariya we bike. Hun dikarin bi hev re karê qeydkirinê çê bikin. Di wî derbarî de bi rêvebiriya baxçeya zarokan re bixvîn û bi wan re hevdişînek çê bikin.
- Ji xweynî vana jî beşa perwerde û serperîştîya taybet bi zarokan li Weinbrennerhaus, di dema dewama wan a fermî de alîkariya we dikin.

Pirsên we hene? Beşa perwerde û serperîştîya taybet bi zarokan amadene ji bo agahî û alîkarên din.

Bajarê Kehl  
Beşa perwerde û serperîştîya zarokan  
Weinbrennerhaus  
Hauptstr. 22  
77964 Kehl

Dema Kar:  
Dûşem – În: Saet 8.30-12.30  
Sêşem : Saet 14 -16.30  
Pêncşem: Saet 14-18

Telefon: 07851 88-2102  
E-Mail: [kitaservice@stadt-kehl.de](mailto:kitaservice@stadt-kehl.de)